# Nûner di birêvebirina karûbarên fermî de alîkariya te dike



Tu bêyî dêûbavên xwe hatiye Fînlandayê.  Lê tu ne bi tenê yî, çunkî gelek mezinên din alîkariya te dikin. Ji selametiya te ya rojane karmendên navenda penaxwazan yan malbateke ku tu têde bijî alîkariya te dikin. Herwiha te nûnerek heye ku di haletên cuda de alîkariya meşandina karûbarên te dike. Li Fînlandayên kesên biçûktir ji 18 salî nabe bi tenê karûbarên xwe yên fermî bimeşînin loma nûnerek alîkariya te dike.

## Nûner çi dike?

- Nûner di birêvebirina karûbarên fermî de alîkariya te dike. Ew li gel te ye eger bo nimûne biçî Daîreya Koçberan yan bingeha polîsan.
- Nûner nêrîna te li ser karûbaran dipirse û piştrast dike ku nêrîna te di karûbarên te de li ber çavan were girtin.
- Nûner herwiha qenaeta xwe jî bo karbidestan dibêje eger di haletên cuda de di berjewendiya te de be.
- Nûner hevkariyê li gel mezin û karên berpirsiyar ji karûbarên te dike.
- Nûner agahiyên derbarên maf û karûbarên te de dide te.
- Eger hewce be, nûner bo te parêzerekî peyda dike.
- Eger tu ji 15 salî biçûktir bî, nûner peymanan, dawanameyan û bîrnameyan li şûna te îmza dike.

## Nûner çi nake?

- Nûner xwedîkirina te ya rojane yan perwerdekirina ya rojane nake û nikare biryarê li ser cihê bicihbûna te bide. Di jiyana rojane de karmendên navenda penaxwazan yan mezinên ku tu li gel wan dijî ji xwedîkirina te berpirsiyar in.
- Nûner bo te tiştan nakire yan pare bi deyn nade te.
- Nûner nabe ku bêyî destûra te behsa karûbarên te bo ti kesî bike.